Rêveberiya dadwerane ya civakî pêngava êkê ye bo rêveberayetiya jinê

Miryem Şêxmûs Esad

Hemû cara ji destkeftiyên tevgera jinan dihête behskirin û ji helwîsta wekheviya di navbera jin û zilamî de dihê gotin. Ev mijare her çende demeke dirêje di rojevê de ye, lê rastiya vê hizirê hîna aşkire nebûye. Demê mirov lêkolîna li ser vê mijarê dike baş dizane ku bi giştî li ser jinê fişareka civakê heye. Lê demê ku jinek behsa zulma zelamî dike, ji xwestekên xwe, ji mafê xwe nerazîbûna didete nîşandan, dihête destnîşankirin ku zelam bihêztire û pitir dikare jinê biparêze her wesa mafê wî heye fişarê lê bike. Ji tiştê biçûk bigire heta yên mezin. Bila her çend bihête gotin ku jin nîvê civakê ye eve bi bawerî nahête gotin, tinê ji bo ku dilê jinê xweş bibe lê geş nebe.

Tiştê ku dihête gotin li ser destkevtiyên dîroka peywendiyan di navbera herdû regezan de hêşta ji rastiyê dûr e. Belku jimareka kêm ji van peywendiya destkevtî bi xwe re îna bin ew jî bi rengekî durist hêşta nekevtine warê jiyanî de, bi taybet di welatên me de, gelek astengî li pêşiya wan hene. Ye ji wan astengiyan ewa ku bi hêrîşên mêran dihête binavkirin ku eve bi rênmayên olî dihîne rewakirin, şer lêdan şermezarkirin îhane hemû kiryar li ba zelam rewane mane xwedanê jinêye, li gel vê hindek dibêjin layengirên jinan mijara zulma li ser jinê mezindkin lipêş civakên me, ku îdî bo nimûne destavêtina cinsî liser jinan kêm bûye, dîsa zordariya cinsî li ser jinên bimêr nemaye, û êdî bi zorê jin çi zilaman nakin yanî teslîmkariya jinan ji holê rabûye, êdî jin wêrek bûye û her tiştî bo xwe pesend nakin û heger hezkirina jinikê ji zelamekî re nema dişê wî bihêle wi berde. Lê eve ne ew mêrxasî û dadweriya ku tevgerên jinan dixwazin pêk bihînin, lê belê qutbûn û xilasbûn jî bi xwere êşên mezin dihînin, û di gelek civakan û malbatan de jineka berdayî yanî jineka mirî, şert û mercên berdanê çi dibin bila bin, yan jî bi zorê şû kiribe yan jî jinek bi ser de înabe û çend bihête zanîn ku zelamê wê jinê xirab bû, dê her şaşiya jinê be, dihê gotin, heger ew jine başba dê nehatiba berdan heger hat û şû jî kir çi bibe û çi nebe dê ji rewişt û pîvanên wê jî dihête giftûgokirin. Di vê watê de destheladariya zelam li ser jinê mafekî ku bi rênma û yasayan hatiye rewakirin yanî heçku

mijareka siruştiye û kes zêde vê rewşê ne normal nabîne, jixwe di gelek cihan de yên ku jinan dikûjin yan jî dibine egerê xwekuştina jinan nahêne dadgehkirin, berdana jinê jî çareyeka miriye bo jina bê desthelat.
Zalbûna paşdemayîna li ser hindek rênmayan yên ku bi ser jiyana jinê de zalin, qedereka reş bi ser jinê de înane, wê li beramber pêlên gelek dijwar de dihêle bi taybet heger bi tinê be li beramber rakêşanên ku ji her alî ve dihêne wê. Ew şûrê hevpeymana hevjîniya bihê hezkirin bihê rêzgirtin bêrehm bi ser jinan de, wê di nav tarîtiyeka dijwar de dihêle, ne tinê ev... Heger hat û mêrê jinekê bimire çênabe dayik xwedanê zarokên xwe be, heger bivê jiyana xwe bo wan terxan bike, biryara wê li ser wan nîne, di perwerdeya wan de û ne jî di jiyana wan de. Her pêwîste çavên wê li destan be û li ber rehma yên ku ji wan re dihên gotin xwedanê wê, li gor xwestek û arezûyên wan divê bizavê bike.
Pirsiyar ewe çara bêçaretiya jinê çiye? Jin dikare çarenivîsa xwe bi xwe binivîse? Heger derfeta jinê hebe dê desthelatdariyê bike, yan jî rêveberyê? Kî dê dadwerane nêzî wê bibe? Hindek dibêjin ku pêwîste dadgehek taybet ji bo jinan bihête damezirandin, ku dadwerê wê dadgehê jineka ku tevahiya êşên jina kêşabe. Da dadwerane biryaran bide, lê eve jî heye, gelek jin cihê xwe di senterên berpirsiyartiyê de digirin, lê hindek ji wan ji mêran bê rehmtir nêzî jinê dibin. Ji ber ku demê ji nişkave desthelat dikeve destê çîneka bindest de, êdî dest bi tolvedanê dikin, misoger evene qayde de ye, lê ez dibêjim heger hat û wesa jî bû, lê civak tinê bi rêveberiya jinê jî naçe serî ji ber ku mêr jî lingekî civakî ye, li vê derê ya herî rast ku hizra desthelatdariyê têk biçe û destpêkî di serê jinê de belku eve ne şayanê jinê ye, jin rêveberiyê xweş dike çi di malê de çi jî di cihên berpirsiyar yên jiyanê û civakê de çi jî di siyasetê de, her layek ji van pêwîste li cem tevgerên jinan yên hevçerx wateyeke wî ya nû hebe, bo nimûne dibêjin siyaset hunera xapandinêye lê ne wesaye berûvajî vê siyaset hunera avakirin û perwerde û geşepêdanê ye. Hunera xweşî peydakirin û ciwankirinêye, lê desthelatdaran we lê kiriye ku mirov ji siyasetê vediciniqe, jê ditirse, lê çawa ku çareya jinê di şer de nîne di tirsê de jî nîne. Divê tiştekî li navberê hebe û li gor baweriya min ew jî rêveberiya dadwerane ya civakiye li vê derê dixwazim destnîşan bikim ku rêveberî ji destheladariyê gelek gelek cawaze û ev mijareka berfirehe ku pêwîste bihê lêkolînkirin û xwandin. Lê ya girîng ewe ku pêwîste jin bizane ku qet nabe di rastiya wê de zalbûn û xwecudagirtin û xweragirtin hebe. Jinên ku van tiştan dikin xwe dixapînin, belku pêwîste jin rêkxistin û perwerdekirin û rêveberiya rasteqîn bo xwe bike armanc, ne wekî em di desthladariya zelaman de dibînin ku rêveber xelkê dikin xizmetkarê xwe. Divê jina rêveber xizmetkarê xelkê be û wesa dê baweriyê ava bike û serpereştiya rêveçûna durist bike. Eve ne dumahîke belku eve destpêke û wesa dê jin zelaliya rastiya rêveberiyê bi xwe ve bihîne û dê bide hemû regez û çînên civakê û dê li ser bingehên saxlem qonaxa avakirinê dest pê bike.